

Versîya Kurmancîya Kafkazê
bi h' erfêd latînî



Dersêd
Xwendina
K'urdî

© Forum Linguistik in Eurasien, Neuenburg, Germany,
email: Forum-Kurmanji@gmx.net

Rudolf û Marianne Schönfeld

Dersêd
Xwendina
K'urdî

Pêşgotin

Eva k'itêba bona wan kurmanca hatîye hazirkirinê, yêd ku h'eta niha bê xwendin û nivîsar mane û h'eyra zimanê xweda ne, dixwazin bi zimanê xwe xeber din, bixûnin û binivîsin. Xwendin û nivîsara bi zimanê dê gelekî h'ewask'ar û şîrin e. Ev yek weke şîrê dê kêrhatî ye, usa jî hînbûna zimanêd xerîb, ku li ser bingehe zimanê dê ava dibe. Lema jî, gava yek ku xwendin û nivîsara zimanê dê r'ind zane, ew r'ih'et zimanêd mayîn hîn dibe û xwendinêda jî pêşda diçe.

Xwendevan dikare we'dekî kinda hîn be. Heger ew bi r'astî bixwaze hîn be, yan jî zû dersêd vê k'itêbê bixûne, ewê bi vî awayî r'ih'et bikaribe hînî xwendina zimanê dê be û zimanê xwe bîr neke.

K'aranîna k'itêbê

K'itêbêda bona her h'erfî dersek heye. Piştî her şeş dersa derseke din heye, ku ew jî giranîya wê ser wek'ilandina dersêd pêşîyê ne.

Ders çawa hatine avakirinê

1 H'erfa nû li jor alîyê çepê kêleka şikil xuya dibe. Bi vî şikilî em hêsa dikarin xebera kêlekê fe'm bikin. P'ir'anîya xeberêd sereke bi h'erfa nû destpêdibin, lê heger bi h'erfa nû destpênebe, dîsa h'erfa nû navda heye. Mesele li dersa donzdehada, bona h'erfa «i» «karik» xebera sereke ye.


2 K'êleka şikil, li alîyê r'astê xeberêda h'erfa nû xuya dibe. Li vê xeberêda h'erfa ku nû tê naskirinê cî digire. Bona wekî h'erfêd bêdengani şaş neyêne gotinê, ew her gav bi h'erfa dengani tê xwendinê. Mesele, li dersa sisîyada xebera «ba» xuya dibe. Heger em t'enê «b» bidine xebatê, meriv wê «bê» bixûnin.

3 Li vir em xebera sereke dîsa hêdî-hêdî ava dikin. Em her gav ji jor û jêrva û alîyê çepê û alîyê r'astêva dixûnin.

4 Ev ders diwek'ilîne ew tiştêd ku berê hatibûne hînkininê. Wek'ilandin bona hînbûna h'erfêd nû gelekî baş e.

5 Li vir h'erfa nû tevî yêd hînbûyî tê r'ûbir'ûkirinê: h'erfêd nû ku weke hev xuya dibin, yan jî li gotinêda weke hev têne r'ûbir'ûkirinê. Ew hin jor û jêrva, hin jî alîyê çepê û r'astêva têne xwendinê. Bona wekî aciz nebin, qenc e ku ew bi lez bêne xwendinê.

6 Merem li vir ew e, ku xeberêd nû bêne avakirinê. Bi hînbûna p'arevekirin û hevvakirina bangêd xebera, xwendina xebera hêsa dibe.

 Li vir mesele jî bona nivîsarê têne dîtîne. Bi r'îya nivîsarê hînbûna xwendinê li prosêsa hînbûnêda alîk'arîke gelekî kêrhatî ye. Lema jî wan merivar'a yêd ku destpêkin hîn bin lazim e deft'ereke bona nivîsarê. Çiyê nivîsarê li vir hindik e û ev tenê bona nîşankirinê ye. Wê ze'f baş be ku xwendevan xwexa xeber û cumlêd nû çêke û tiştêd nû, yêd ku têne bîra wî binivîse û hevalê xwe jî bide nivîsarê.

Dersêd jêrê wê pey dersa 8-r'a xuya bin.

7 Li vir em firqiyêd r'êzimanî û fonêtîkî hîn dikin. Têkstêd xwendinêda h'erfêd derbazbûyî nivîsar in, lê carna bona zimanê r'ast me h'erfêd nû dane xebatê. Têkst hêdî-hêdî dirêj dibin, digihîjine mezinaya xweye normal. Wekî têkst xweş û r'ih'et bêne xwendinê û sebeb hebe bona xeberdanê, lazim e ku her kes destpêke xwexa li ser têksta xwe bixebite û paşê têkst bê xwendinê. Heger dersdar pîrsa li ser tiştêd ku hatine xwendinê bipirse, hingê xwendevan dikarin baş fe'm bikin. Wekîlandina xwendinê wê gelekî baş be.

R'êza h'erfa - Li bin her r'ûp'elî elifbe heye. Em ji xwendevana dixwazin ku ew ser her r'ûp'elî h'erfa nû bigere û r'eng bike. Ev yek wê gelekî k'arê bide we, mesele, evê xwendina ferhengokê hêsa bike.




Bona hînbûnê sînor t'une. Kê ku bi vê k'itêbê baş hîn be, ewê bikaribe hinekêd din jî hîn bike. Bi vî awayî hînbûna xwe wê pêşda bibe.

Em ji h'emû hevalêd xwe gelekî r'azî ne, ku bona vê k'itêbê alîk'arîya me kirin: Nadirê Efo, Barîsê Xelîl, Sûrênê Şîrin, K'axtsrîka Şamil, Gula Qereman, Nîna Mihêr, Dênîs û Nîkolas Bêylî û dostêd mayîn.

Em li xwendinêda wer'a xweşbextiyê dixwazin!


R'adolf û Meryem

H'êrfêd denganî



1

A a
N n



nan²
an

3

a an
an nan

an⁴
nan




.... III 000

a a

n n

an nan Anna

Eva nan e.



1

R r



baran²
bar
ar

3

a ar bar
ar bar baran

ar⁴
bar
baran

5

ar ar
bar nar



R R

r r

bar baran Baran


7



baran Baran



1




ber

2

be

e

3





4

5



7





r'abe
r'ab 2
r'a

3

a r'a r'ab
r'a r'ab r'abe

4

r'ab
r'abe

5

r'a r'e r'er
ba be ber

6

R' R'

r' !!!!

r'a r'eb R'abe!

7

Nar'a r'abe!  *r'r'r'!!!*

Aa	Nn	Bb	Rr	Ee	R'r'
----	----	----	----	----	------

 a A n _ e _ b _ r _ r' _



Eva _ _ _ _ e.



Eva _ _ _ _ e.



Eva _ _ _ e.



Eva _ _ _ e.



Na _ _ _abe!



Eva ne baran e.



Eva ne nan e.



R'anebe!

Anna, eva ber e.

Eva nan e.

R'abe, Nar'a!

Baran e!

x e X μ r E x Å N b Æ a n B

1

K'k'
Kk



k'er 2
k'e

3

e k'e
k'e k'er

k'e 4
k'er

5

k'a k'ar k'er
ba bar ber


6

ne k'e ne
nek'ene

k'e rek
k'erek

K'a k'er?
Nek'ene!
K'er k'ar nake.






K'er yan ker'?

K'er ker' e? Na, k'er ne ker'
e. K'er k'ar nake.

K'a Nar'a? Nar'a ber k'era.

Nar'a ker' e, r'eben e.

 K' K

 k' k


???

K'a k'er? K'er ker' e?

Na, k'er ne ker' e.

Nar'a r'eben e, ker' e.


1




r'ê

2


ê




3






4




5



6



7




K'a beran?

Beran ber baranê ye.

Beran r'êber e.

Erê, r'eben.

R'êber ber baranê ye.



  Ê

 ê


erê, r'êber, beran, k'êrek,

k'erek, barê k'erê,

r'ê, r'eben, baranê bê


Beran r'êber e.

1




yek ²
ye




3




5



6



7



Yek yek e.

Yek nan nanek e.

Yek banan

bananek e.



Ev banan ya k'ê ye?

Banana Nar'ayê ye.



y y

y y

Yek yek e.

Yek banan bananek e.

Banana Nar'ayê ye.

Nanê Annayê ye.


1



dar
da


2

3





4

5



6



7



dara Baran

darê Baran



K'er k'ar nake?

K'erê ber'de,
baranê bê.

K'er ber darê ye, ka
ber k'erê ye.



D D

d d

dara Baran, darê Baran

Nar'ayê k'er ber'da. K'er

ber darê ye. Ka ber k'erê

ye. Deyn nebe, derd e.

1



karik

2

rik

ri

i

3

i ik rik
ik rik karik

4

i

ik

rik

karik

5

bin din kin
ben den ken
ban dan kan

6

bi de
bide

Be dir
Bedir

r'a di be
r'adibe

ni ka re
nikare

7

*dikare r'abe, nikare r'abe,
bikaribe r'abe*

Birê Annayê Bedir e. Bedir dikare karikê bibe? Na, karik nikare r'abe. Bira nikare, debirê bide karikê. Nên bide karikê.



↓ /

↓ i

kirin, dikarin, nikarin


Karik nikare r'abe.

K'a debirê bide karikê !

K'a kayê bide karikê !

1

Xw
xw



xwê 2

3

ê
xwê

4

ê
xwê

5

xwa	xwe	xwê
ya	ye	yê
da	de	dê

6

bi xwe
bixwe

ne xwar
nexwar

xwar in
xwarin

7


Dê dibê: «Bixwe, bixwe!»

Dê dibê:


«Karikê, bixwe, bixwe!»

Karikê nanê xwe xwar?

Na, karikê xwarina xwe
nexwar, xwê xwar, debira xwe
xwar.




Kk K'k' Êê Yy Dd Ii Xw xw



karik

1



K'a k'er? K'er ber darê ye.

K'erê k'ar kir?

Na, k'erê k'ar nekir.

K'a Baran? Baran bi

bir'ekê dar dibir'e.

rd nd rk' rb yn



derd, r'ind, berk', derb,
k'erb, deyn


K'a karik?

Bedir dibê: «Inê binêr'e!

Karik r'adibe?»


Inê dibê: «Erê, erê, karik
r'adibe. Karikê debira xwe
xwar, xwêya xwe xwar.

R'ê bide karikê.»



abvgdêee'jzîykk'lmnoup'p'r'r'stt'ûfxhh'çç'c'şiqw

1

H h		hêk	2
H' h'		hê	

3

ê hê hêk	<table border="1"> <tr> <td>hê</td> <td>4</td> </tr> <tr> <td>hêk</td> </tr> <tr> <td>hêkek</td> </tr> </table>	hê	4	hêk	hêkek
hê		4			
hêk					
hêkek					
hê hêk hêkek					




5

hin hên hen	<table border="1"> <tr> <td>hê</td> </tr> <tr> <td>hêk</td> </tr> <tr> <td>hêkek</td> </tr> </table>	hê	hêk	hêkek
hê				
hêk				
hêkek				
din dên den				
bin bên ben				

6

de he	he r'e	h'e ram	H'i nar
dehe	he'r'e	h'eram	H'inar


7

	h		h'	
	hêk		h'inar	

Dik'ana H'inarêda ar, xwê, hêk,
dendik ... hene.

Dê Annayêr'a dibê: «Anna, her'e
dik'anê ba H'inarê.

Dehe hêka, dendika, hinek xwê
bik'ir'e. Hêka h'eram
neke!»



H H

H' H'

h h




h' h'

De her'e dik'anê ba H'inarê!

hinek nan, hinek h'inar

Anna hindik dide birê xwe.

Bira hindik be, bira r'ind be.



Be'r ber derê H'inarê ye. E'rdê

H'inarê kin e, ber be'rê ye.

H'inar be'rê dinihêr'e.

Be'r r'ind e. Bayê be'rê hênik e,

xwê ye. Xwedê e'rd û be'r r'ind

kir.



E'

e'

H'inar be'rê dinihêr'e.

Be'r r'ind e. Ba hênik e.

Xwedê e'rd r'ind kir.

Xwedê be'r r'ind kir.

1

Mm



mêr

2

mê

3

ê mê mêt
mê mêt mêrek

4

mê
mêt
mêrek

5

min men mên
kin ken kên
din den dên

6

k'e-rem ke
k'erem ke

Meh'-med
Meh'med

bim-ba-rem
bimbarek

7

*Bim -
barek*

*K'e -
rem ke !*

*Meh' -
med*

*Aba-
ran*

E'reba Ah'mede r'ind heye.
 Birê Ah'med dik'ene, dibê: «Bim-
 barek be! Em dikarin her'in ba
 Memê?» «Erê, k'erem ke!»
 Memê dibê: «Emê her'in ba Meh'-
 med.» Meh'med dibê: «Niha em
 her'in bajarê me.» Ah'med dibê:
 «Na, em nikarin her'in bajarê me.
 Ev e'rebe ya min e.»



M M


m m

Bimbarek be, Ah'med!

K'erem ke, Meh'med!

Em her'in bajarê me.

Ah'med mer'd e.



3

a ma mal
ma mal malek

4

ma
mal
malek

5

lê li la le
mê mi ma me
dê di da de

6

be-lê belê	de-lal delal	ka-lik kalik	le-ma lema
---------------	-----------------	-----------------	---------------

7

mê: mala me, dara me
nêr: malê me, darê me

Kalkê min delal e. Mala kalkê min
k'êleka meda ye. Inê meheke ne
malda ye. Kalkê min niha hinek lal
e. Lema em kalkê xwe mala xweda
dihêlin. Xwarina mala me kalik bi
dil dixwe.



L

l

Kalkê min delal e.

Inê ne li malê ye.

Bira dil bi dil be.

mala me, malêd me

1 J j  jin 2
ji

3 i ji jin
ji jin jînik ji 4

5 jin jên jan
min mên man
lin lên lan jin
jînik

6 ba-jar
bajar jin-bi-ra
jinbira di-rêj
dirêj

7 *ji malê, bi malê, li malê,
Jannar'a, ber be'rê, bajêrda*

Janna jinbira min e, ji bajarê me ye.
 Birê min meheke li bajarekî din
 maye. Lê Janna li mala me ye.
 Birayê min ne'meyeke dirêj
 Jannayêr'a lê kir. Janna,
 de bêje, ev ne'me ya k'ê ye?
 Janna dibêje:
 «Ya min e, ya min e!»



J J



j j

jin + mal, bejin + bal,

ne'meyeke dirêj

Janna jinbira min e. Janna

ji bajarê me ye.

1   2

dîk
dî
î

3 4

î dî dîk
dî dîk dîkek

dî
dîk
dîkek

5

bîr mîr jîr
bir mir jir
bêr mêr jêr

6

î-dî îdî	bî-ne bîne	jî-yîn jîyîn	bel-kî belkî
-------------	---------------	-----------------	-----------------

7

Dîk dike: «Qî-qilî-qîî!»

Nîna dîk dibîne bin darêda. Dîk dike:

«Qî-qilî-qîîî, qî-qilî-qîîî!»

Nîna derd dike dîk dibêje:


«Min bîne malê. Nan bide min!»

Nîna dîk dibe malê, nan didê.

Dîk dike:

«Qî-qilî-qîîî, qî-qilî-qîîî!»

Îdî bes e.



î

î

Hêdî hêdî, dîk! Belkî dîk

jinêd xwer'a dibêje:

«Îdî r'abin, hêka bikin?»

jîyîn + mirin

H h H' h' E' e' M m L l J j Î î



<u>a</u>	b	—	e'	—	h	—	î	—	k	—	m	—	ê
A	<u>B</u>	D	—	H'	—	I	—	J	—	L	—	H	—



malda ye




ber
malê ye



bin baranê ye



bi dilê xwe



bin e'rebêda ye



Bira bê
ba min!



Бъра бе ба мън!



e' a e



e': be'r, e'rd, e'rebe, e'mir, e'nî

a: bar, baran, nan, mal, bajar

e: ber, nek'ene, k'er, erê, delal

K'a dîyarî?

Meh'med r'êber e. Dîyarîk anî mala xwe. Bira dibêje: «K'a dîyarî?»

Lê Meh'med dîyarîyê nikare bibîne.

Her dera nihêr'î. Malda nihêr'î, ber dêrî nihêr'î, lê nedît. Belkî e'rebêda maye?

K'a dîyarî?

Belkî em dikarin dîyarîyê bibînin?

Dîyarî _____ ye.



h h'




h: ha, hindik, hêdî hêdî, hêk, hirmê

h': h'eram, h'al, h'eb, h'ine, h'er'î

abvgdêee'jzîykk'lmnoupp'rr'stt'ûfxhh'çç'cşiqw

1



şekir

2

şek

şe

3

e şe şek
şe şek şekir

4

şe
şek
şekir

5

şêr şer şîr
jêr jer jîr
mêr mer mîr

6

şa-yî
şayî

Şe-mal
Şemal

şî-rin
şîrin

nî-şan
nîşan

7

kalkê min, kalkê minî delal

Şekir nîşaneke şayîyê ye!

Kalkê min Şemal mala meda ye.

- Kalkê minî delal, şîrinayî
xweş e, bixwe?

- Şîr bîne! Şîr bi şekir
şîrin e, baş e.

- Nebîyê min dibêje şekir
diranar'a nebaş e.

- Şîrinayî baş e. Şekir
nîşaneke şayîyê ye.



Ş Ş

Ş Ş

şîn + şayî, şayî + xweşî,

Alîkî dinê şîn e, alîk şayî.

Nan bi şîr xwarina mîr.

Şîrinayî baş e.

1

T t
T' t'



tirî
ti

2

3

i ti tir
ti tir tirî

ti
tir
tirî

4

5

tî t'êr t'il
tî têr til
dî dêr dil


6

T'ê-lî
T'êlî

t'e-mam
t'emam

Tî-tal
Tîtal

7



Tirîyê r'eş, tirîyê xweş

E'rdê meda tirî heye. Tirîyê r'eş e,
şîrin e, te'ma tirîyê xweş e.

T'êlî tirîyê r'eş anî, Tîtal!

Tîtal te'ma tirîyê t'êr nabe, t'emam
xwar. T'êlîyêr'a dibêje: «Tirî te'm e,
hinek jî jê da jina min.»

T'êlî dibêje: «Erê, derdanê t'ijî
daynim.»

  **T**  **T**

 **t**  **t**



T'êlî tirî anî da t'emama.

Tirîyê r'eş e, tirîyê xweş e.

Me t'êr xwar, T'êlî!

Xweş, xweştir, daha xweş e.

1



bûk

2

bû

û

3

û bû bûk
bû bûk bûkek

4

bû
bûk
bûkek

5

bûn rûn dûr tûr
bîn rîn dîr tîr
bên rên dêr têr

6

mi-jûl
mijûl

rû-nin
rûnin

di-şir-mîş
dişirmîş

7

*Bûka malê mijûl bû, mijûl
bibû, mijûl dibû, mijûl bûye.*

Bira bûk bê!

Dayîka malê t'imê mala xweda mijûl dibe. K'arê mala xwe dike, betal nabe, nikare hinekî r'ûnê.

Îdî ût'î dike, dişirmîş dibe:

«K'arê min her t'im heye. K'î dikare alî min bike? Belkî bûkekê bînin, k'arê min hindik be.

Bira bûk bê!»



û û

û û

mijûl bûn, bûn û nebûn

Bûk ji dûr û dirêj tê.

Dayîka malê r'ûnî,

bûka te niha mijûl dibe.

1

Ç'	ç'
Ç	ç



ç'îya 2
ç'î

3

î	ç'î
ç'î	ç'îya

4

ç'î
ç'îya


5

çi	çû	çê
ti	tû	tê
şi	şû	şê

6

çe-tin	çim-kî	çê-lek	çê-re
çetin	çimkî	çêlek	çêre

7



ç'îya ç' ç çadir

Dema berê r'ind bû

Dema bihar dihat, em t'imê diçûne ç'îyê. R'îya me dûr û dirêj bû. Hinekî çetin bû, çimkî h'emû mî û ç'êlek mer'a bûn. Lê ç'îya mer'a xweş û hênik bû. Me çadir danî. Me li ç'îyê ç'êlek diç'êrandin. Şîrê ç'êleka adan bû. Şîr mîna şekir şîrin bû. Em çend meha li ç'îyê man. E'mrê meyî li ç'îyê baş bû.

↻ Ç' Ç

↻ ç' ç

Hûn çî dibêjin?

Hûn çima diçûne ç'îya?

Şîrê ç'êleka adan bû.

ç'îya û banî, ç'em û kanî

1

S s



sih'et ²
si

3

i si
si sih'et

si ⁴
sih'et

5

si sî sê sû
ti tî tê tû
çi çî çê çû

6

î-sal	h'e-sab	Sû-rên	si-sê
îsal	h'esab	Sûrên	sisê

7

*Sih'et çend e?
Sih'et sisîya dehe kê m e.*

Sih'et çend e?

Kalkê me çû dikanê, birê minî biç'ûk
Sûrên'r'a sih'etek k'ir'î. Sih'et ne biha
bû, baş bû. Lê Sûrên nikare sih'etê r'ast
bêje.

Malda sê sih'etada me Sûrên hîn kir.
Niha r'ast dibêje
sih'et çend e.



S S

S S

Sih'et çend e? Sih'et sisê ye.

Sih'et yek e. Sih'et sisîya

dehe kê m e. Sih'et çar e.

Serê kesê r'ast, t'imê bilind e.

1 G g  genim ²
gen
ge

3 e ge gen
ge gen genim ge
gen
genim ⁴

5 ga gê gi
ta tê ti
ça çê çi

6 a-gir
agir ç'en-gek
ç'engek gi-rar
girar ge-lek
gelek

7 *Dema me xwest em girara xwe
bixwin me nikaribû . . .*

Me çi çêkir emê bixwin?

Dîya min girar danî ser êgir, çû ber ç'êlekê.

Hinekî şûnda dîsa hat, ç'engek xwê li girarê kir û dîsa çû.

Hinekî şûnda bûka malê hat, dît girar ser êgir e, xwê kirê û çû ût'îyê bike.

Hinekî şûnda keç'ka malê hat, hinek jî xwê kire girarê.

Dema me xwest em girara xwe bixwin me nikaribû, çimkî gelekî şor' bû.



G G

g g

Girar gelek te'm e.

Genim yan garis?




Geleka nede hindika.

Girara bê xwê jî bê te'm e.

Şş Tt T't' Û û Çç' Ç Ss Gg

Biç'ûkêd bûmê kor maka
xwer'a dibêjin:

«Dayê, ji vê hêlûna me
bîn tê. Em her'in hêlûneke din çêkin.»
Maka biç'ûka jî dibêje: «Bîn ji hêlûnê
nayê, em k'uda jî her'in, ew bînê bê,
çimkî bîn ji me tê.»



*tîşt, tût, tek û tenê,
têr, tamam, tirî, te'm,
Têlî, tilî, te'l, tijî, mast*

*kûçik, çiya, çend,
çadir, keçik, çêlek,
çima, çem, diçin,
çêrandin, çardeh*

ç' ç



✍ **Dersa 22-da binihêr'e û t'ijî bike!**

Kalkê min _____ mala meda ye.

- Kalkê minî delal, şîrinayî

_____ e, bixwe?

- _____ bîne! Şîr bi şekir

_____ e, baş e,

- Nebîyê min dibêje şekir

diranar'a _____ e.

- Şîrinayî baş e. _____

nîşaneke şayîyê ye.

Em bi «kirin» çi dikin?

Em hîn dikin, hûr dikin, jê dikin,

bilind dikin, dirêj dikin, li xwe

dikin, r'akin, serjêkin ...





✍ **Giran - girantir - daha giran e**

Tirîyê min ji yê te girantir e.

R'îya min ji ya te dirêj _____ e.

Keç'ka min ji ya te delal _____ e.

Lê Seyran ji h'emûya şîrin _____ e.



Gundê meyî K'urda

Gundê me gelekî xweş e, gelek dik'an hene. 150 mal têda dijîn. Mî û ç'êleka gelek xwey dikin. E'rdê gundê meda gelek kulîrkêd r'eng-r'engî hene. Ç'îyada jî gelek gur hene.

Em ditirsin ku mîyêd me bixwin.

Gulê netirse! Em nahêlin gur mîyêd te bixwin.

Stiranek: Ax gundê me, gundê me.



Gelek xweş e gundê me.

R'enga dirêj gunde me,

kanîya şir'ik gundê me.



U U






U U

K'urd û K'urdistan, kund û bûm,

gul û gulistan, gund û bajar

K'erê mirî ji gur natirse.

Ax gundê me, gundê me . . .



Xalîçeke nexş-nexşî

Xûşka Xerîb xalîçê r'ind çêdike.

R'îsêd r'eng-r'engî bînin, ku xalîçe nexş-nexşî be.

Xidir çû dik'anê, r'îsêd r'eng-r'engî anî, da Xerîbê.

Xerîbê her tişt xwexa dikir. Sing k'utan, t'evna xwe daxist, r'îsê xwe r'agirt û r'ûnişt, çêkir.

Dehekîda xalîçe xilaz kir.

Xerîb gelekî şa bû, çimkî xalîçe r'ind bû.



X

x

xêr û xweşî , xal-xalî,

xalîçe nexş-nexşî

Xebera xweş xweş e,

xebera nexweş kula r'êş e.

1 W w  de'wat ²
 wat
 wa

3 a wa wat
wa wat de'wat wa ⁴
wat
de'wat

5 wî wê we
xî xê xe
xwî xwê xwe

6 we-kî
wekî we-rin
werin de-rew
derew ewa-na
ewana

7 *wextê ku bê:
Emê wî canegayê r'eş serjêkin*

Wextê de'watê

Meha ku bê gundê meda de'wateke gelekî xweş wê hebe. Werin em k'arê xwe bikin, wekî her'ine wê de'watê. Xwendîyêd de'watê wê gelek bên. Xweyê de'watê wê t'extekî r'ind dayne. Her tişt wê gelek be.

Emê canegayê r'eş serjêkin, şeş berxa jî seva k'ibaba. Jin jî wê nanê tendûrê lê xin. Bîna wî nanî gelek xweş e. Ewana jî wê şerbetê çêkin, wekî de'wat şîrin be.



W W




W W

Nan bi xwê, xwê bi te'm.

Dema ku mirt'iv bir'çî dibin

de'watê bîr tînin.

Derew dijminê Xwedê ye.



E'detê de'watê berê

Sîyar bûkê ji mala bavê wê derdixin û wê tînin mala ze'vê. H'eta sîyar h'emû digihîjin, dengbêj dest bi sazbandîya k'urdî dikin.

Mêvan h'emû dik'evine govendê.

Gava bûkê tînin li ber derî, em nahêlin ew bik'eve malê, h'etanî ze'va sêvê sêrî nexê.

Lê bûk dir'eve û dik'eve malê.

Ew wê derê dimîne û h'emû berbûk dik'evine govendê.

Xwarina me jî xweş e û her tişt gelek e.

Em sê r'oja û sê şeva de'watê dikin û şa dibin.



V V



V V

Av nava virar'a naçe.

Mêvan mêvanêd Xwedê ne.

Te çi xwar, li te sih'et be.

Lê te çi anî, li me nîvek'arî.



R'oja te xêr, Kalo!

R'ojekê em çûne mala kalkê xwe. Me got: «R'oja te xêr, Kalo. Tu çawa yî?» Mer'a qawe anîn. Me malda torta malê xwar. Me jî wê derê tolme çêkirin.

Me t'evî xwe sêvêd sor û tirî biribûn mala kalkê xwe. Kalkê me jî gelek serhatî ji jîyîna berê gilî kirin. Çawa gundê meda bû, ava gola gundê me her gav xweş bû, çol-çolistana me jî gelekî şîn bû.

Xweş bû ku em sê r'oj, sê şeva mala kalkê xweda man. Ew r'oj gelekî r'ojêd xweş bûn. Oxir be!



o O

o O

dost û heval, heval û hogir,

oxir û silamet, k'esk û sor,

çol û çolistan. Ji şêmîkê h'eta

şêmîkê oxir gerekê hebe.



3

a	qaw
qa	qawe

4

qa
qawe

5

qor	qir	qur	qêr
kor	kir	kur	kêr
gor	gir	gur	gêr

6

ha-qas	qe-wat	Qu-dret	qa-yîm
haqas	qewat	Qudret	qayîm

7

*Wextê derbazbûyî:
Hevalêd me hatine mal.*

Qawa me qewatê dide

Hevalêd min hatine mal, westîyayî bûn, ji qewatê k'etibûn.

Min gote qîza xwe: «Bona hevalêd min qawekê dayne ser.» Qudretê h'esab kir çend meriv hatine, wekî haqasî jî çêke.

Ewê jî av, şekir, qawe t'evhev kirin, danî ser êgir. Min got: «Qudret, êgir qayîm ke, wekî qawe zû bik'ele.»

Ewê got: «Ezê niha gur' kim.» Qawe k'elîya, lê ne gelekî, wekî te'ma wê xweş be.

Hevalêd me qawe vexwarin û gotin: «Dinyayêda qawa we gelekî xweş e.»



Q Q

q q

Qawa me her gav te'm e, qewatê dide. Barê aqila li piştakêmaqila. Yê ku k'ar nake, heqê wîyî xeberdanê t'une.

U u X x W w V v O o Q q




W V



de_ _ekirî _elat _ere
 _ala _eger'in he_al e'_r
 de_let _e'de ke_ir he_a

Li xeberêd ek's biger'e!

baş	kevin
çetin	nebaş
te'rî	xemgîn
silamet	vala
nû	r'onayî
şa	nexweş
t'ijî	hêsa
aqil	axmax



Şêr şêr e,
 çi jin
 çi mêr e.

Gotinok: Tiştêkî min heyê,
 li vî alî dar, li wî alî dar,
 navberêda goştê jar.
 Gelo ev çi ye?



Dehe xebera biger'e!

1	2	3	4	5
<i>g</i>	<i>u</i>	<i>n</i>	<i>d</i>	<i>r</i>

1-2-3-4 *gund* 7-9-3

4-2-4-2 6-2-5-4

6	7	8	9	10
<i>k'</i>	<i>ç</i>	<i>t</i>	<i>û</i>	<i>s</i>

4-9-5 4-9

10-8-9 10-9-8

1-2-5 3-9



Ax gundê me


Ax gundê me, gundê me,
gelek xweş e, gundê me.




R'enga dirêj gundê me,
kanîya şir'ik gundê me.



Xortêd delal gundê me,
keç'êd bedew, gundê me.


Ax gundê me, gundê me,
gul û sosin, gundê me.


T'enê r'ind e, gundê me,
gelek xweş e, gundê me.



1  2  

3  4 

5 

6 

7 *Min xalîçek fîrot, te fîraq fîro-
tin, wî berx fîrotin, me fîl fîrot.*

Pê fîlê Feto R'ewanêda

R'ojekê em bi fîlê Feto çûne bajarê
R'ewanê. Wê derê me xalîçeke r'ind firot.
R'ewanêda her tişt difirotin: goşt, êmîş,
firaq, şal û kastûmêd r'ind, solêd biha,
kulîrkêd r'eng-r'engî.
Her tişt hebû, lê gelek biha bûn.
Me wê derê firaq xwer'a k'ir'în. Feto
jî xwer'a çû fûtbolê nihêr'î, çimkî Feto
fûtbolîst bû. Lê em fikirîn ku her tişt bê
feyde ye.



→ F

f f

fire û dewlemend, fêl û firt,

şa û k'êfxweş Me fîl firot.

Dengê defê ji dûrva xweş e.

1

P p
P'p'



payîz 2
pa

3

a pa
pa payîz

pa 4
payîz

5

p'or	p'êr	p'îr
bor	bêr	bîr
vor	vêr	vîr


6

pî-vaz	pîr-ka	p'in-car'	Sî-p'an
pîvaz	pîrka	p'incar'	Sîp'an

7


pamîdor

p



p'

p'incar'



Pîrka me

Par min xwelîya xweda gelek pamîdor, pîvaz, p'incar', bîber, badircan û lobî çandin. H'eta payîzê xwelîyê berekî r'ind da. Pîrka me h'eftê pênc salî ye, lê her gav alî min dike.

Ewê pamîdor t'op kirin, şûştin, p'ar-p'arî kirin, seva de'watê kirin banka. Paşê ewê pamîdor, p'incar' û penêr kirine p'êşa xwe, çû, bin darê r'ûnişt, xwar. Hinekî bin darêda p'alda, wekî hêsa be. Heger pîrka min alî min nekira, ezê hazir nîbûma.

stiranek: Sîp'an, Sîp'an, ç'îyayê K'urda...



p' p' p


p' p' p

Mast û sîr p'ara mîr.

Fatma nevîya, ew aqil e

mîna qadîya, lê dîsa pîrsa

xwe dike ji gundîya.

1 Z z  zeveşş 2
zev
ze

3 e ze zev
ze zev zeveşş ze
zev
zeveşş 4

5 ze zû zi zê
se sû si sê
şe şû şî şê

6 Zî-nê
Zî-nê Za-do
Zado me-zin
mezin zo-zan
zozan

7 *H'erfêd mezin t'enê bona
nava û destpêbûna cumla ne.*

Zado qîzeke gelekî zane ye

Zînê hate mala Zado, got: «Zadînê, mer'a zeveşekî mezin bîne, bira zar'ok bixwin. Evana zeveş gelekî h'iz dikin.» Zado zane k'îjan zeveş gihîştî ye. Ew pê t'ilîya xwe awa lê dixê û tîne.

Zêna Zado ze'f e, xeysetê wê jî zêr' e.

Zar'otîya xweda gelek hîn bûye.

Lema jî her tiştî zane.

Zozan hate xwazgînî, ku Zadoyê bona kur'ê xwe bixwaze, çimkî Zado qîzeke gelekî zane ye.



Z Z






Z z

R'asto r'êda, qelpe zerêda.

E'zman bê steyrk nabe, ç'e'v

nabîne, lê divê lê bi-ger'e.

Dinya bi dor e, ne bi zor e.




Solêd Casim

Carekê cînarê me Casim cotek sol k'ir'îbû.
Lê sol ne r'ind bûn, zû qetîyan. Casim
kur'ê xweyî mezin Cemal şand got: «Her'e,
çakûç'ê cînêr bîne, wekî ez çend mixa lê
xim.»

Cemal xwer'a nedît, neçû, çakûç' neanî.
Celat kur'ê wîyî biç'ûk bû. Wî ew jî şand
got: «Celat, her'e bîne.» Celat jî çû, bir'ek
anî. Bavê got: «Kur'ê min, bir'ek ne lazim e,
lê çakûç', wekî ez solêd xwe mix kim.»

Casim xwexa çû, çakûç' anî, solêd
xwe mix kirin û p'ê kir.



Cînarê meriv nebaş be, meriv

jê dir'êve. Aqil t'acê zêr'în e,

li serê her kesîda nîne.

Z z F f P p P'p' C c



f v w



_ûtbol _ite_it ber_
_ere _ala _ekî _ire
_ar pî_az h'er_
he_al de'_at

Pê lemp'a li me diger'in

Du xort ji ber k'ermêşa r'evîn,
çûn ser banî r'azan.

Lê demekê şûnda dîtin ku mêşek
ji wan mêşêd ku poç'ê wan diç'irûsin, r'onayîyê
dide, li ser serê wan vize-viz bû.

Yekî hevalê xwer'a got:


«Kur'ò, serê xwe têke binê leh'êfê. Va ye,
pê lemp'a li me diger'in».




s z



_o_an _or _or î_al
imbêl pîro derba_
_ar _ar' der_dar _i_ê
_eveş k'e_k _êr' _a_
îdî be_e!

 *ez dinivîs* ___ *tu dinivîs* ___
ew dinivîs ___ *em dinivîs* ___
hûn dinivîs ___ *ewana dinivîs* ___



kin ___ *awa?* ___ *i?* ___ *îya*
 ___ *î* *ba* ___ *ar* ___ *arna* ___ *înar*
 ___ *imkî* ___ *î* ___ *ar* ___ *anega*
 ___ *akû* ___ ___ *erm*

Qijqijka xwendî

Qijqijka r'êş li ser darekê danîbû û kerî penêr jî devê wêda bû. R'ûvî wê derêr'a derbaz dibe, ç'e'vê wî li penêr dik'eve, şir'ik ji dêv diçe. Hingê bi dengêkî nazik û şîrin ji qij-qijkêr'a dibêje: «Demeke dût û dirêj e, ku min dengê teyî xweş û delal nebihîstîye.

Çi dibe hela minr'a stiranekê bêje.»

Qijqijk pêşîyê penêrê devê xweda dixwe, paşê vediger'e ser r'ûvî û jêr'a aha dibêje: «Birayê r'ûvî, min ev serhatî zûva xwendîye, her'e, xwer'a qijqijkeke nexwendî biger'e!»



abvgdêee'jzîykk'lmnoup'rr'stt'ûfxhh'çç'çşiqw

h'erfêd k'urdî (Kafkazê latîmî)	h'erfêd k'urdî (Tirkîdêda latîmî)	h'erfêd r'ûsî	h'erfêd ermenî
Aa	Aa	А а	Ա ա
Bb	Bb	Б б	Բ բ
Vv	Vv	В в	Վ վ
Gg	Gg	Г г	Գ գ
Dd	Dd	Д д	Դ դ
Êê	Êê	Е е	Է է
Ee	Ee		
E'e'	Ee		
Jj	Jj	Ж ж	Ժ ժ
Zz	Zz	З з	Չ չ
Îî	Îî	И и	Ի ի
Yy	Yy	Й й	Յ յ
Kk	Kk	К к	Կ կ
K'k'	Kk		Ք թ
Ll	Ll	Л л	Լ լ
Mm	Mm	М м	Մ մ
Nn	Nn	Н н	Ն ն
Oo	Oo	О о	Օ օ
Uu	Uu		

h'erfêd k'urdî (kîrîfî)	h'erfêd k'urdî (latîmî)	h'erfêd r'ûsî	h'erfêd ermenî
Pp	Pp	П п	Պ պ
P'p'	Pp		Փ փ
Rr	Rr	Р р	Ր ր
R'r'	Rr		Ռ ռ
Ss	Ss	С с	Ս ս
Tt	Tt	Т т	Տ տ
T't'	Tt		Թ թ
Ûû	Ûû	У у	Ո ո Ո ո
Ff	Ff	Ф ф	Ֆ ֆ
Xx	Xx	Х х	Խ ք
Hh	Hh		Հ հ
H'h'	Hh		
Çç	Çç	Ч ч	Չ չ
Ç'ç'	Çç		Ճ ճ
Cc	Cc		Չ Չ
Şş	Şş	Ш ш	Շ շ
li	li		Ը ը
Qq	Qq		
Ww	Ww		

Pêşgotin	2	dersa 21	wek'ilandin	38	
dersa 1	H' erfêd denganî	4	dersa 22	Ş şekir	40
dersa 2	A N nan	5	dersa 23	T' T tirî t'îlî	42
dersa 3	B ba	6	dersa 24	Û bûk	44
dersa 4	R baran	7	dersa 25	Ç' Ç ç'îya çadir	46
dersa 5	E ber	8	dersa 26	S sih'et	48
dersa 6	R' rabe	9	dersa 27	G genim	50
dersa 7	wek'ilandin	10	dersa 28	wek'ilandin	52
dersa 8	K' K k'er ker'	12	dersa 29	U gund	54
dersa 9	Ê r'ê	14	dersa 30	X xaliçe	56
dersa 10	Y yek	16	dersa 31	W de'wat	58
dersa 11	D dar	18	dersa 32	V sêv	60
dersa 12	I karik	20	dersa 33	O oxir	62
dersa 13	Xw xwê	22	dersa 34	Q qawe	64
dersa 14	wek'ilandin	24	dersa 35	wek'ilandin	66
dersa 15	H' H hêk h'inar	26	dersa 36	F fil	68
dersa 16	E' be'r	28	dersa 37	P P' payîz p'incar'	70
dersa 17	M mêt	30	dersa 38	Z zeveş	72
dersa 18	L mal	32	dersa 39	C cînar	74
dersa 19	J jin	34	dersa 40	wek'ilandin	76
dersa 20	Î dik	36		H' erfêd k'urdî	78

Kurmancî zimanekî p'ir' xweş û
 dewlemend e, ew mîna xiznê ye.
 K'urdê ku zimanê xwe xwey dike,
 ew bona wî dewlemendîk e



Xwendevanêd delal!


*Hûn îdî niha baş xwendin û nivîsarê zanin.
 Hûn vê r'îya hînbûnêda gelekî serwaxt û
 jêhatî derk'etin.*

*Xwendin û nivîsandina we li we bimbarek
 û pîroz be!*

*Niha lazim e, ku hûn
 her gav bi zimanê xwe
 binivîsin û bixûnin,
 wekî hûn dîsa bîr nekin,
 nezaniyêda paşda neçin.
 Ew kesê serk'etî heger bi vê k'itêbê
 bixebite, ew dikare kesêd din jî
 hînî awazê hînbûnê ke.*



Berê
xwendinê
şîrin e.



© Forum Linguistik in Eurasien e.V.
An der Schwemme 4, 79499 Kandern/Germany